

Pirtûkxan Çarçira y çanda kudî



Bavê Serbest

NÊRGIZ

(١)

Helbest
Hesekê 2004

Nêrgiz (1)

- Helbest
- Bavê Serbest
- Çapa yekem 2004 z 2616 k
- Deranîn : Azad
- Mafêن çapkîrinê parastîne jî helbestvan re

Diyarî

Diyarî ji bo azadîxwazên zindana û
hemû dost û hevalên minî kevn û bi
hêvî me ku rê û ronî li pêşıya wan
vebin, bêtir li dê û bavêن hemû
pakrawanêن kurdistanê teva ez serê
xwe li ber wan ditewînim....

Bavê Serbest

1992 – 2004

Helbest

3 Nêrgiz (1)

KURTE JIYANA MIN

Serê xwe bi eşîra mezin nakim, lê dixwazim ji xwendevananre bidim xuyakirin ji hezarê salan de bav û kalên me jiyana xwe li ser vê xakê bûrandine.

Navê min Yûnisê Hemê Hisêne, sala 1947 an li gundê Soxanê hêla bajarê Amûdê ji dayik bûme, navê eşîra me (Deqorya)ye yek ji eşîrên kurdan yê kevnin di Cezîrê de, kalik û bavpîrê me berî sedê salan li gundê Hisê Romî bûn û ji wan re digotin Al kina....

Bavê min piştî bûna min bi salekê mir, ez bi diya xwe re koçberî gundê Talikê nêzîk Hesekê bûm, şes sala li dibistana gund min xwend paşê ez çûm gundê Xirbe Şie'ib başûrî çemê xabûr hêla çayê Ebdulezîzê nav merovê xwe...

Sala 1967 ez tev li karê partyê bûm û her perçebûnek çê dibû min karê xwe hinkî radiwestand...

Lê bê fêde bû sala 1992 partya me ya binavê Yekîti belavokek derxist ji bo bîranîna sîh salî di ser (serjimara awarte) re ya di sala 1962an de

pêkhatibû bûrî, asayış ez tev li gelek hevala girtim û em
birin Şamê Zindana Edra. li wir ev dîwan li ser kaxetê
pakêta min nivîsand .

Spasiya min ji hemû hevalên ku alîkarâ bi min re kirin û
dixwazim hûn kêmaniya bibûrînin.

B-Serbest
25-7-2004

PÊŞGOTIN

5

Nêrgiz (1)

Heger merov li jiyana her nivîskarî birame, jixweber hev beşiyekê li bal pirê wan dibîne, wisan jî nivîskarê kurd (Yûnis Hemê) gelek nîrên dijwar û jiyana zehmet kêşiyê bûrandiye lê hêjaye gotinê yê ko ewê hûnandineke ciwan li hevok û malikên helbesta xwe kiriye.

Nivîskar sudake baş ji filiklora Kurdî dîtiye û ji biyok û nêrgiz û binefşen zargotina Kurdan civandiye, her wiha karîbû bi zimanê zarokan straneke rewan û bi wate bistirîne ...

Gava pend, metelok û cîrokêna bav û bavpîran bi helbestî bi rist û tiraz ji xwendevanan re pêşkêş bibin, bi hêsanî ew gencîniya tora me tête parastin, li gelek helbestan Yûnis ev aniye ziman û xwe ji bingehê cîrokê jî bi dûr nexistiye...

Ev dîwan ezmûneya nivîskar ya yekemîne, helbet ne bê kêmanîye lê piştî ko dikeve destê xwendevan ew nema milkê nivîskare ..û her xwendevan bi nirxandina pirtûkê serbeste ...

heger ez roniyeke berfireh li dîwanê bikim, dibe ez bi nerîna xwe şaş bim yan rast bim,

dîsa ezê ne li gor daxwaza her kesî bipeyivim, lewra
min xwest ez xwendevan bi pertûkê re mejûl
bihêlim...û hêvya serketinê ji helbestvan Yûnis re
dixwazim .

Ezîz Xemcivîn
28 / 7 / 2004

QAWÎŞA ŞEŞA

Qawîşa şesa jimar diwazde
Pencer ji hesin bê reng û perde
Zindanek ne xweş cê kul û xema
Em lê civandin hêvya me nema
Ji sê partiya tev xortê Rêzan

çarde kesin em j' gelê Kurdistan.

Şam-Zindana edra
30-12-1992

BIRÊ EVÎNÎ

NÊRGIZÊ

Nêrgiza min nêrgizê

8

Nêrgiz (1)

Delalê tim rengizê
Bîna xweşî jê dizê
Mîna çayê Hindirîn

* * *

Tû kesk û zer û sorî
Weke alê bi morî
Rabin wê hildin jorî
Jê têr nabim bi nerîn

* * *

Çi kulîlk û heleze
Rû wek nîvişkê peze
Ezê bêmê bi geze
Zivistanê li xurîn

* * *

Sêv û hirmî j' min dizî
Ez li pê ew jî bezî
Ser zîvirî go xwezî
Rû gewezê hingivîn
* * *

Ketin nav dar û xeta
Lê difirin wek beta
Dora me av û şeta

Xema bavê bid evîn

* * *

Çav bikilê ribatê
zû pê vekin xelatê
Piştî meha sibatê
Wê bê adara rengîn

* * *

Bi gotin û bi gazin
Tev henek û tinazin
Ji bavê wê bixwazin
Bejin bilinda nermîn

* * *

Ka dawetê li dar xin
Dijî çavê neyar xin
zû bûka xwe li kar xin
bi halan û bi qîrîn

* * *

Li govendê bûne rêz
Xort û keç bi xeml û xêz
Pir bedewe ev himêz
Serî bi taca zêrîn

* * *

Tac û teyles lite tê
Xwe b' hejîne l' dawetê
Aşîtî çiqa l' me tê
Ji bîr bikin gir û kîn

* * *

Sozek mezin me danî
Sûnd bi gora berzanî
Te nadim bi erzanî
Mîrin çiye eger jîn.

1- 4 - 2003

MEŞE GOVENDÊ

Şêrîna min çav reşe
Desta bigir bimeşe
Wek buharê tû geşe
Ol parêze j' laleşe

* * *

Gulya ser sîngê dîne
Memka pêr bihejîne
Taqî sorê rengîne
Riwê te hingivîne

* * *

Govendê em xweş bikin
Kul û xema j' bîr bikin
Dilê pîsa reş bikin
Rewanê xwe geş biken

* * *

bilinda min ziravê
Danê sibê çû avê
Gulfî gihane navê
Agir berda hinavê
* * *

Dawet li vir geryaye
Dor dara hirmiyaye
Gul û çîçek vedaye
Çavê belek kil daye

* * *

Sorbûne rû û devê
Ber çava dernakevê

Ne'b rojê ne bi şevê
Hiş û ceger bi te vê

* * *

Ji min re bûye armanc
Hey rihanê tu kurmanc
Bi şahî seyran û genc
Zû bistînin ewa qenc

* * *

Ka em herin Kurdistan
Li ser çiya tev zozan
Nava ava ber çeman
Havînî wek zivistan

* * *

Tev bi dar û bi devî
Dinav gelde wek hevî
Bera dijmin birevî
Xelata mi j' wî devî

* * *

Ramûsim dev û lêva
Hinarê rû wek sêva

Bi xal û gerd û peyva
Bedew sitêrk û heyva

* * *

Herdû çavên hêni jî
Min gote wê her bijî
Nava dil de tim bijî
Bi çûke xifşa bejî

* * *

Her û wer û her û wer
Ala sor û kesk û zer
Min danîbû her never
Bera dijmin bux keser

* * *

Dijminê kotî bi gir
Dilê wî tije kevir
Bera zû here ji vir
Dawet xweşê li hundir

* * *

Sitemkaro bi gemar
Wa ji jorde hate xwar
Wî bikin piç û zîvar

Berdênenê pêtî û ar

* * *

Bişewite wek qirik
Ser û nig û dev û zik
Çi bi wî bê hîn hindik
Li destâ bikin bitik

* * *

Jî dijmin nekin bawer
Berdênenê fîşek û ber
Gel azadkin seraser
Zû bixînin ev himber

* * *

Me ji dest wî gelek dî
Tev li hev bibin xwedî
Çi bajarî çi gundî
Gelê kurdox û mîdî

* * *

Bera bimre û hey here
Wey xwedêyo, e btere
Pêşmerga girtin sere

Tev bihişt û gewere

* * *

Pêşmergê mîrxas û rind
Serê me j' ber wan bilind
Avakin bajar û gund
Jî dijmin re çend û çend

* * *

Azad bikin Kurdistan
Bikin şahî û dîlan
Bi sûnd û tor û peyman
Rakin vî dijminê han

* * *

Me tê dida gelek zîn
Hin zêr û gewher û xwîn
Tevde rabin bêñ amîn
Kurdistanê ji mer bîn.

Şam- Zindana edra
27-3-1993

YARÊ

Serî hilde ey hevalê
Perdê bavêj rû bi xalê
Evîndarê bejn û balê
Were carek te bibîne

* * *

Ebrû zirav tenik lêvê
Hinarê rû bimin sêvê
Mi kes navê ji wê pêvê
Evîndara mi perwîne

* * *

Ji piş perdê gulek avêt
Herdû lêva gote min êt
Weke dîlan nikarim bêt
Heta ezel jiter yare

* * *

Şev û rojê li bala min
Di xewnê tê xeyala min
Carek tenê bidata min
Çen û lêvê hingivîne

* * *

Ber pencera te mam hejar
Şev û rojê belê her car
ji hêz ketim va tême xwar
Cerg û hinav qey hesine

* * *

Zerî çavê hirmî davê
Zêrîn gulî giha navê
Biba rehme'l dê û bavê
Dilê xemgîn ne êşîne

* * *

Seher bi zû ew birê ket
Herdû çavan gava pê ket
Dil û ceger pêre vêket
Bilind û rind û şêrîne

* * *

Ji min dûr ket hebîbetî
Esîrê te melîketî
Rîm elfela ya muqletî
Tal elxiyab va bû sene

* * *

Dinya li min bûye şev reş
Hat bîra min ew rojên xweş
Qews û qezeh wek gula geş
D'evînê de ez û tu ne

* * *

Çima dîsa te nabînim
bi kul û cerg bi ahînim
Jî yek dîmen ez xemgînim
Lêv û diran birincîne

* * *

Gava ji dûrve tû hebî
Wek kirâsê Yûsiv nebî
Her can û hişêm'pêre bî
Omîd û sosina mine

* * *

Heyla gidî lê emetê
EZ ban dikim vê ometê
Sêne rojêni qiyqmetê
Pir hêvî û dergeh, hene

* * *

Ji renga seraser yarê
Di bermir bûrî her carê
Weke rojê li êvarê
Evîna me hezkirine

* * *

Yarê ji zêr û gewhere
Enya kever wek mermere
Bîn ji miskê ji enbere
Gulbarîn û rû li kene

* * *

Ey buhişta ezel sema
Wek kulîlka liber çema
Ba lê dixîne her dema
Pir xweşike meyl û tene

* * *

Wek ji pesnê Pêxembere
Pir hesene rû û sere
Zend evista ji ezbere
Tev nav û nîşanê tene

* * *

Vê horiya li nav avê
Xwe derîne tu her gavê
Da bibîne ro û tavê
Banêrê wêneya tene

* * *

Bûn esîrê pirs û peyda
Dê bîskînin bend û qeyda
Nayêm rayê biner seyda
Çilgin bûme wilo dîne

* * *

Çil gin bûme wek dîn û har
Dinya tevdi'l min bû neyar
Ji her tiştî mame bê par
Çima wilo tub'gazine

* * *

Rabû liser qamê bi ten
Bisk ketî ser sînga li ken
Kî dixwaze mi gotî ben
Dest û pêçiya gul çinc

* * *

Liser qesrê xuya kir way
Herdû destâ digote bay
Dengê nerme bilûr û nay
Îro newe carek dine

* * *

Bi rê ketim dil jikestî
Ew jî liwir bûye mestî
Qey wê carek nebe sistî
Çewte çebera bişkîne

Şam-zindana edra

ŞOXÊ

Erê şoxê were şengê
Wek buharê renge rengê
Por zerînê serî pengê
Nava gelan dabû dengê

* * *

Weke arim ne dijwarim
Herdû çavan ez dixwarim
Gava nayê wilo jarim
Evîna te de hevparim

* * *

Wilo xweş bi timî geşbe
Li nav şevê gelkî reşbe
Gelawêje ne darfeşbe
Weke hîva heşt û şeşbe

* * *

Mizgîn li te va roj hilat
Li ba reşê bûye felat

Wa sitendin eywan û lat
Lê pir kirin kar û xebat

* * *

Erê canê erê vanê
Rû sorbûne perişanê
Deka rûnê li eywanê
Vê civetê tu heyvanê

* * *

Bûye mizgîn bûye halan
Me sitendî terş û talan
Were rûnê bide palan
Vê civetê nav hevalan

* * *

Em bigêncin em bi kalin
Tevde di vê rêd hevalin
Xwedî tarîx û bi malin
Di mêjiwêd' pir zelalin

Hesekê
8 - 6 - 2004

BIRÊ CIVAKÎ

DERMANÊ GURIYA

Hebû carek ji cara
Rehme l' bavê guhdara
 Hatî salek bê baran
 Zuha bû erd û ezman
Kevin çû, nû jî nehat
Bû reş meha qirimqat
 Teba tilûr tev dicîd
 Banga hêvî bi omîd

Hatin meh û diçûn roj
Cîhan tevde bibû doj
Hûr û gir lê dicivyan
Ber nigê şahê teyran
Tev neçarî bi xwezî
Kî wê here wardozî
Wek karkera wek mîran Baz
û şahîn difiryan
Firek xurt û pir bilind
Ne bajar û nejî gund
Bi qîrîn û bi fêtin
Mêrgek mezin didîtin

Pez û dewarê mirî
Serê teva jêkirî
Ne banêr ne nobet kar
Gelkî pirin bê Jimar
Devakî qelew û ciwan
Ew jî mirî li nav wan
Çi dîmena bi girî
Baz li şahîn zîvirî
Eger heye ev fene
Lê bê darik û bene
Ew şahînê per xweşik
Ser û baskê wî pitik

Bi mîranî wilo got
Emê herdû bibin cot
Bê gazin û bê fedî
Emê bêjin me nedî
Li pêş şahê wî xweda
Herdûka bersiv dida
Wê civata pir fire
Tev birçî û kêm xure

Qijalk û qiralka reş
Wa jî dilê xwe kir xwes
Emê herin war dozî
Kîne şahîn û bazî
Anîn mizgîn bû halan
Ser serê şahê teyran
Liber wîna bûne cot
Herdûka bihevre got
Ey patîşahê zeman
Gorî tebî ser û can
Vê xwarina gelkî pir
Devakî mezin û gir
Wê panava rast û xwes
Dilê te wê bibe ges
Bû êrîş û çûne wir
Herkê hinek ji xwer bir

Ne bicûk û ne kulek
Deve çêye'j bo melek
Peyakî jîrek û germ
Veşartî bû li ber term

Ji bo teyra û ew banêr
Bende şahê ser bi zêr
Gava wî hat û danî
Canê xwe da b' erzanî
Bê xirîn û firte firt
Herdû nigê wî digirt
Bi hêsanî jêre got
Nêzîk teye melkemot
Îdî nema tu melek
Li bende tene gelek
Nexweşiyek gelkî pîs
Li nav êlê bûye lîs
Tev gurîne ser û can
Xwîna te j' ware derman
Şah ji nûve duşilmîş
Ev çi kar bû ev çi iş
Ci pîlan bû ey eman
Dikim bidim ruh û can
Pir hilat û pir dahat
ji mirnê nema felat

Nekir bi ya şepala
Da pê şopa mirdala

Ronî lê bû şeva reş
Çîroka mi j' were xweş

Hesekê
28 - 5 - 2004

PISİKÊ SOR

Pisîkê sor diran beş
Sûndek xwar bi kevrê reş
Nema dike guneha
Rojî girtî çend meha
Bera mişk tev derkevin
Çol û dera vekevin
Bi aştî bi selamet
Tev biçêrin bê minet
Li nav teba wek hevî
Bera hew kes birevî
Îro ciwamêr bende war
Ne wek berê tirse kar
Ne derew û ne bencim
Da zanibin çi qencim
Şâşik cube li xwe kir
Saloxdan zû bela kir
Bûye çaxê aşîtyê
Nema dikim xerabyê
Mişka salox zûbihîst
Li dor qula kirin lîst

Wek leşkerê Furs û Rom
 Tevde li wir bûne kom
 Gelo kiye gelkî jîr
 Ka em herin cem yê pîr
 Bi tevger û bi ser kêş
 Kesê mezin dane pêş
 Kom civînek wan danîn
 Bi pîlan û bi zanîn
 Ew yextyarê pir baqil
 Ban dikir a çav bikil
 Ka tu dibê çi jina jîr
 Wê çawa bi ev tevdîr
 Hej gotina nakim qet
 Biner kîne ev ezbet
 Ewê jina zar hozan
 Gazî kirye ey eman
 Ev tebakî reng sîxur
 Wek dijwariya bayê kur
 Terî rep û rast û çep
 Dil ji ber wî terpe rep

Ser dîwara bi çindik
 Siviktire ji beytik
 Dest û pê bi laperûşk
 Gelkî tûjin qeramûşk

Çav sorekî pir xwîn rêj
Herdû qîlê wî dirêj
Rêzanê şek û peka
Zûdve dijminê müşka
Berî van dem û sala
Şîreta bav û kala
Pir bi gef û bi sotin
Her dem ji mer digotin
Riya merov dibe bost
Dijmin ticar nabe dost

Şam- Zindana Edra

BANG

Gelî kurda bibin yek
Guh nedin dijminê b' dek
Perçebûnê ticar nek
Tev wek bira xweh û kek

* * *

Çi yekîtî ci partî

Tev ji darkê yek katî
Bi tevger û civatî
Dûrî şerê xweb xwetî

* * *

Rêberyê bidin zana
Jîrik û xwendevana
Şîreta bav û Ana
Xelasî ser hildana

* * *

Li ser rêça Berzanî
Gelek me l' vê rê danî
Pir şehîd pakrewanî
Zordesfî bar giranî

* * *

Dijminê pîs û zor kir
Wan kurdistan perçe kir
Xak û mal tev talan kir
Bi derew û xapê pir

* * *

Çi wî b' serê me d' anî
Hin dîlî hin xizanî
Xerakir mal û xanî

Kuştin malxwê kevanî

* * *

Pir sitemkar û qirêj
Ji derda bûme deng bêj
Ne bi rojî ne li mêj
Li zindanê ker û gêj

* * *

Wek gela bibin ser dest
Bav û kala wilo xwest
Yek ji wa Bavê Serbest
Bera nevî nebin mest

Zindana Qamişlo
10-10-1994

HEVPARIYA TEBA

Li wê şeva reş û sar
Sê teba bûne hevpar
Şêrê mêt gur û rovî
Çûn nêçîra pez kovî
Geryan car û newala
Li ser çiya per pala
Xezal gamêş bi keryan
Hin veşartî di revyan
Kovîkî qelew û xurt

Hersya li wir ew digirt
Li ber golek tije av
Dorê herî bi çirav
Şêr got kiye pir zana
Dijî şas û nezana
Pir cwamêr gelkî çake
Vê nêcîrê li me parke
Gurê dev reş bi terî
Li kovyê mirî nerî
Go ezim rêzanê heqyê
Bi giram û bi weqyê

Îşev ne şas û ne gêj
Şêr go de ka ji mer bêj
Gur peyivî wilo got
Nekin gazin pole pot
Hust û parsû û qîpik
Ji bo şêrê ser incik
Herdû hêt nermê piştê
Pişka mi gurê deştê
Nig û serî û pişik
Ew jî pa rovyê pîsik
Şêr li ser wî zîvirî
Bi awirên tûj nerî
Hey gurê berya çawa

Ma çî te û van hawa
 Tû pir hove ne cwamêr
 Çawa bû ortaxê şêr
 Tû bû dizê jêr û jor
 Kujendê beranê sor
 Gelek berx û mî û kar
 Te ew kuştin dest gemar

Lepek li serê Gur xist
 Nav çirava nerm û sist
 Jê herikî xwîna germ
 Li wê Navê bi bû term
 Rovî dîbû xwîn û meyt
 Li ber şêrê weke heyt
 Hin û hin çû nêzîk şêr
 Ban kir şahê ser bi zêr
 Bes dirana bik teq teq
 Ev gur pir şaş û ehmeq
 Ezim rêzan û adil
 Vî karî bikim ji dil
 Qanûn xwendî ji ezber
 Hîn bûna min ji ezher
 Biner çi rind û çakim
 Nêcîrê çawa parkim
 Dil û kezeb hin parxwan

Ji ter taştêk çi yeman
Herdû pîl û hinkî din
Navroja şahê mezin

Dûv û fatreşk û gurçik
Ji bo şîvê pir xweşik
Şêr dest danî ser kovî
Sed eferî'j bo rovî
Li vê şeva reş bi tirs
Bid bersiva evan pirs
Çi tû hîn kir vê heqyê ?
Go termê gur nav heryê

Hesekê
1-3-2003

ADAR

37 Nêrgiz (1)

Newroz û ser sal
Rengîne wek al
Tev mîr û şepal
Nexete xûn û mal

Adar

Buhar û zinar
Çiya û bajar
Gelê birîn dar
Kawa bibû ar

Adar

Çû sitem û zor
Bimre diktator
Qêrîn gelê hor
Livir û li jor

Adar

Diya kurdistan
Bişkê her zindan
Serok hat serdan
Pêre dil û can

Aadar

Silava welat
Li deşt û li lat
Her kes û her qat
Tevde bibne pat

Aadar

Baran û xunav
Xweşî û lîlav
Ser dil û hinav
Bi dar û bi av

Aadar

Hêvî û etûn
Zanko û hebûn
Maf û serxwebûn
Va em û va hûn

Aadar

Millet da biryar
Tevde bi yek car
Bo te hildin dar
Hin şûr û hin zar

Adar

Tu bûka cîhan
Nemîne lêdan
Aşîfî û eman
Ser xakê Aryan

Adar

Sozek bi mer da
Neyar bik winda
Hêvî bi xweda
Em jî li benda

Adar

Li deşt û çiyan
Bibû berxwedan
Sitendin eywan
Neviyê berzan

Şam-zindana edra
8-3-1993

ÇEKO Û SÊVÊ

Sêvê û çeko xweh bira
Weke du çêlyê şêra

Ji dê çê bibûn cêwî
 Paşê herdû bûn sêwî
 Dê û bavê wan mirin
 Kul û xem bi xwer birin
 Di malê de man tenê
 Gel kar û barê dinê
 Bibaşî û ciwan mêtî
 Jiyana wan dibûrî
 Kur mal xwê keç kevanî
 Bi tevdîr û bi zanî
 Sêvê keçek pir çeleng
 Li navâ gund dabû deng
 Rû zêrîn û çav belek
 Bejin bilind por xelek
 Jêhatî jina mala
 Kedera xort û kala
 Her karê wê bi zanî
 Teva xwezî pê tanî

Ew keça delal û baş
 Kete nav gumanin şas
 Tasek vala j' mal anî
 Li ser zikê xwe danî
 Kiras bi serde berda
 Bi bena tev girê da

Biner çawa guh dêre
 Hezkirna bira jêre
 Rok dudo sisê û çar
 Nava bira vêket ar
 Jimar nebû deh û bîst
 Gundya teva xweş bihîst
 Heyfa jina jîr zana
 Bo çîrok ser zimana
 Kê ew kir û kê nekir
 Sêvê wa xwe avis kir
 Ew birayê wek leheng
 Bîr û bawer maye teng
 Van kuri pistê gunda
 Der û rê lê kir winda

Li mal maye wer mestî
 Dilê wî tim şikestî
 Ser di berde ji fedya
 Nema wilo diqedya
 Bankirî xwaka şêrîn
 Ker û kurtêñ ji mir bîn
 Emê herdû herin êş
 Ezê bajom tu serkêş
 Bi rê ketin çûne aş
 Herdû bi hevre yol daş

Nigek li pêş yek li paş
Gelo raste ya ez şas
Bi ser wê de fitilî
Hin bi hêrs û du dilî
Çeko wilo jêre got
Te dilê min gelkî sot
Em ji malbatek bilind
Niha bûne kêmê gund
Ev tiştaya pir şerme
Li nav êlê di gel me

Çima wilo por zerê
Dest avête xincerê
Divê li vir tu bimre
Ev nav ji ser me vemre
Sêvê banker na bira
Qey dilê te j' kevira
Ev ne raste tev henek
Guh mede gotin û şek
Biner çawa ewle me
Ez Sêvê mi xwa teme
Wilo nebe dil xemgîn
Bi çavê xwe tu bibîn
Herdû dest zû lebitîn
Li ber noqê xebitîn

Benê pişta xwe vekir
Çara tasê xuya kir
Li wir ket û çingiya
Lê deng neçû gundiya
Çeko rûnişt û girî
Diran simbêl tev birrî

Berge çû nema vejer
Gelek zor bû ev bûyer
Çi rastî ci derew be
Li nav gunda wê ew be
Bi destekî xurt ne sist
Xincer li sêvê dixist
Wê keça nazik ciwan
Carek tenê go eman
Sitêrka serê çiya
Li wir ket û xiliya
Ew jina giran başî
Rewan da bi yek şâşî
Ser wê qadê ma erzan
Nava serma zivistan
Bira xwîşka xwe di kuşt
Li wan çol û dera hişt
Bi vê ra û tevdîrê
Şerm nehat ser eşîrê.

LOKÊ SOR

Dewlemendekî mi kir
Bi zêr û dewarê pir
 Bi şivan û bi gavan
 Dawî çê kir bazir gan
Deve û hesp û kerê jar
Bi êşkenc û bi gemar
 Bi bar û bi kul û êş
 Her dem devebû ser kêş
Çerxa cîhan digerya
Nexweş ket nava ciya
 Li her tiştî poşman bû
 Sitem û zora kir bû
Bi xap û bi konevan
Ew bibû baş bazirgan
 Berî xirîna dawî
 Xwedê hate bîra wî
Şandibû dû ker lala
Hemû karker û pala
 Hêvî ji wan bibûrin
 Kar û barejê kirin

Dêwê çav reş bi milik
 Her birçîbû dev û zik
 Herdû tilî kirin cot
 Çend gotin ji wîre got
 Her tiştî j' ter dibûrim
 Yekê tenê na bûrim
 Rahiştina bar û xêş
 Ez bûm ewê zehmet kêş
 Bîn bîra xwe kar û meş
 Gava rabû bayê reş
 Nêzîk çayê xelatê
 Riya çûn û nehatê
 Bû baran û bû bahoz
 Bar tev avêt kerê boz
 Bê gazin û bê fehêt
 Kir çinivin gêt û nêt
 Te barê wî jî l' mikir
 Bû wek hokek gelek gir
 Paşê çû tav nema hêz
 Dinya bibû xêze vêz
 Çû zehmetî nema êş
 Te kerê kem kir pêşkêş.

PAKREWAN

Pakrawanê kurd ji bo te silav
 Tû pir hêjaye ser dil û hinav

Dara azadyê bi xwînê av da
Rawanê buha bi erzanî da

Ew xwîna paqij di berde rijand
Xelatek mezin ji dû te sitand

Bûye can fida li ser xaka xwe
Ronî û keleh bo milletê xwe

Sênc û çeberê dijmin te şikand
Çerxa cîhanê bi xurtî gerand

Azadya welat ji tere bû doz
Ji dû na veger pêre dabû soz

Di mîjiwê de hat danîn bi zêr
Ew mîrxasê baş ew kesê bi kêr

Pelê pirtûkê bide şehdebûn
Mizgîna welat dema serxwebûn

Nava buhiştê tevde bûne yek
Ketin govendê kesk û zerin çek

Serê govendê berzanyê nemir
Serkêşê kurdan livir û li wir

Milletê zindî tu car na mirî
Bi hêrs û for ta ne tirs û girî

Me sûnd û peyman liser rêça te
Têkoşer her dem bo armanca te

Ala kesk û zer vaye hat hildan
Sera ser welat bûye berxwedan

Tevde bûne yek gundî û bajar
Natirsin ji wan şêrin weke ar

Li cîna kuştin derin di talan
Tucar natirsin ji heps û zindan

Soza milletê kurdan bi Yezdan
Li ser vê rêçê bikin berxwedan

Hesekê

KALO

Nêzik cejna qurbanê
Dema ger û seyranê
Kalê dil pak û rî boz
Bizarokar dabû soz

Berbangê ket rê bi lez
 Qûrîna şivanê pez
 Berê xwe da car bekir
 Da bîni çek û şekir
 Kalê mezin û yextyar
 Wê çawa bighê bajar
 Reşê kerkî ji dûr xuya
 Nav kevira ser çiya
 Li pê wî mîrkî çeleng
 Zend û bend weke leheng
 Barê êzinga ser ker
 Bi destâ rişmake zer
 Bi gulik û bi xelek
 Ser piya şalka belek
 Kalê li bende rûnişt
 Qalûna wî qışte qışt

Piştî silav û kilav
 Bi nermî û bi lav lav
 Birazî bi barê dêr
 Gelo tê here bajêr ?
 Belê kalê rind û baş
 Ez û tu îro yol daş
 Pir xerabe xizanî
 Kalo keser hilanî

Başe ku em bûn heval
 Ka ji mir bike galgal
 Apê Hozan û dil soz
 Her çavê wî l' kerê boz
 Birazî wilo meke
 Kulê min tev raneke
 Hêdî li wî vegerand
 Di ber xwede nuhirand
 Li gav û demê berê
 Ez bûm swarê şê zerê
 Rim ji dwazde movika
 Kilê çavê keçika

Pişt ji hevo pêçayî
 Xincer zîvê kil dayî
 Simbel sorî sor sinî
 Zend û bendê al kinî
 Bi şûr û gurz û mertal
 Weke te gênc û şepal
 Îro li min geryaye
 Feleka bê bext waye
 Kone bûn zarwê zina
 Ji me stendin bi fena
 Kulê min tev raneke
 Dijmin bi xap û deke

Ji mir bêje kurê mêt
Bê çawa bighêm bajêr
Ezî kalim yextyarim
Ger û meşê nikarim
Biner barê te b' çiye
Bidin mafê dudiye
Van êzinga bavêj vir
Nav dar û çol û kevir

Siwarêm li kerê han
Li bajêr bibim mêvan
Ew çav reşê bi xincer
Destek danî li ser ker
Bi gora dê hezarê
Ez nakim vê bazarê
Mijek kişand ji tûtin
Li ku bin êzingê min

Şam – zindana edra
25-3-1993

BEGMEZ

Hey lo Silo xizano
Tu b' halê xwe nizano
 Du hîz ji dimsâ tirî
 Kerê reş pê barkirî
Berê xwe dabû bajêr
Ew peyayê gelkî mîr
 Wê mîrdîna dilovan
 Silo lê dibû mîvan
Berê xwe da firoş geh
Ew bi tirkî nezan seh
 Hîzê dimsê bi çiye
 Bi pere û mecîdiye
Bişti wîna dims firot
Di ber xwe di wilô got
 Ezê Herim bi gerim
 Tiştekî xweş bi kirim
Bera zarok şâ bi bin
Nav mala bela bi bin
 Çavê wana li rê ye
 Li hêviya bavê ye

Silo hingî digerya
 Ber dikana û derya
 Ro li wîna gerya bû
 Li nav bajêr winda bû
 Bê guman awir danî
 Ji kêm hişî û ne zanî
 Yekî çav şîn diran beş
 Ser serî şifqake reş
 Ban dike werin begmez
 Çêtire j' nîvişkê pez
 Ser zimana dihile
 Ê go bixwe bê kule
 Şêrîne weke gezo
 Hûn werênê zo bi zo
 Ewî mîrê çen bi rî
 Hinek begmez dikirî
 Wê êvara gelkî sar
 Li kerê reş bû siwar
 Berê xwe dabû malê
 Nêzik cejna sersalê

Tilî di begmez dakir
Ser zimana bela kir
Bi telaqê jin Fatê
Ev ji dimsa talatê

Şam- zindana edra
23-3-1993

ROVIYÊ BEJÊ Û È ÇIYÊ

Rovyê bejê beyara
Revyâ ji cî û wara
Nava dar û deviya
Bin newala ser çiya
Berê xwe da bû ber jor
Birçî bûnê lê kir zor
Tevde teht û asêteng

Van kaniyê b' nav û deng

Bi bend û rez û werzin
Teba li nav di bezin

Dem li nîvê şevê bû
Pêrgî rovyê çiyê bû

Bi gotin û bi şîret
Pir zehmete ev ser xet

Ser xaçe rêkek bi çiv
Ba li dara guve guv

Herdû di rê de di çûn
Rengê wana wilo cûn

Biner fenê te çendin
Ev der tev rez û bendif

Pirin xefk û xapînok
Li nav dara ber cihok

Tu nizane ev feqin
Ji bin erdê di teqin

Weke bumba qumbila
Dişkînin dest û mila

Ne wek beryê û cara
Li dor êla buhara

Nêçîrvan pir di gerin
Bi tajiya me digrin

Her kes xelkê roviya

Têne nasîn bi fena
Li ewropa bi zana
Her welatek bi sazek
Her zimanek daxwazek

Li beryê û ser çiya
Li derna pîs û şasin
Li cînî din pir başin
Rovyê beryê dûra got
Hin bi zirta hin bi fot

Fenê mi bi xwe çîlin
Lê dilê mi tev kulin
Ê çiyê dîsa jêr got
Çi gotinê beribot

De ka zû bi meş bi lez
Berî bib şevîna pez

Kuro dûrbe vaye feq
Xwe qevastî weke deq

Gelkî rast û bîn fere
Ne wek hinka gur gure

Te pir kirin xap û dek
Ê min bi xwe tenê yek

Pir birçî bûn li qîtin
Dûvkî berana dîtin

Ew birçiyê melliqî

Zik bi biştêv zeliqî

Hate ser go ey felek
Ev xwarin xweş û gelek

Çi bez û dûvê mezin
Hêjaye bib' şîva min

Ne gemar û geniye
Ji cotkarya ketiye

Gezek mezin lê di xist
Tevde bezê nerm û sist

Diran ne kir kirte kirt
Xefkê dest û nig di girt

Gazî kirî ey hewar
Ketim vê xefka dijwar

Ji bîr kirin xap û dek
Ji çil fenî ne û yek

Çak roviyê ser xetê
Hate cem ê bin xetê

Hey birako şiyar be
Vê şîretê guhdar be

Xwe bimirûs bi virik
Ji serî ta bighê zik

Mikûs tevî bik pîsî
Xwe bimrîne wek rêsî

Bexçe van te bavêje

Di ber xwede wê bêje

Çi roviyê pîs gemar
Di xefkê d' bûye mirar

Dîsa her cî û beiya
Tu bes vege ser çiya

Hesekê
7-6-2004

SERDANA MEZEL

58

Nêrgiz (1)

Dostê pir hêja bi nav û nîşan
Sed rehme lê bi Xelîlê ferman

Gelek nan û xwê me bi hevre xwar
Hin bi şêranî hin gazin û kar

Bi ger û civîn gelek newroza
Azadî xwaz bûn ser cî û doza

Li wan şevê reş serma zivistan
Di gel yextyara xortê dibistan

Bi dan û stendin geh bi bîn a teng
Şirove dibû pir celeb û reng

Bi saw û tırsê ji ber tırs kara
Bi xebat û kar gund û bajara

Gelek der û cî em lê digeryan
Ji bona welat me kir berxwedan

Nayê j' bîrkirin ne bû poşmanî
Demek gelkî zû te serî danî

Di dilê me di ma gulek rengîn

Ser te me kişand pir girî û şîn

Ji ber ku ti bû hey welat parêz
Bo te min danîn ev rist û ev xêz

Sozek bi tere xellê dilbirîn
Roja azadyê bidim te mizgîn

Hesekê

LI ZINDANÊ

Li vê zindanê wilo sar
Kul û xem lê bê jimar

Her dibînin xewnê reş
Razana wê pir ne xweş

Li eywanê her û wer
Dest berdayî bê xincer
Ne şînî ne şînkayî
Ser me ezmankî sayî

Dorê kirtî bi hesin
Leşker û sngo û din

Pir mezini be toprax
Nayê Jimar bê çend max
Bilind û pencer li jor
Tev lê civandin bi zor
Rêzan û gelek celeb
Ji cizîr û ji heleb
Sosyalist û colbêra
Em tev girtiyê edra
Ji wan hene rind û baş
Di pêşî d' Umer qeşaş

Komonîst û dîmuqrat
Daxwaza wî her gel, pat
Carna dibe kuri pist
Gerek ev ben bibe sist
Li wê navê meş û ger
Riwê hinka gelkî zer
Ew zû de girtin ji mal
Ser war bûrî dem û sal
Ji me nare ticar gir
Dil jiwan weke kevir
Tev ket ser hev dicivya
Bimîne sal û nevya
Bû êvar ez rûniştî
Derî, pencer tev girtî

Ketim guman û tefkîr
Hat bîrê xakê Cizîr
Gava çûbûn koçeryê
Li buharê wê beryê
Ji bîr nakim cavê b' kil
Sêpî lolib û navkil

Kerê cûnî bi kurtan
Xortê malê dû şivan
Pişt bi rext û bi xincer
Ne wek mexol û teter
Şalik û kurkê hirî
Ne simbêl û ne bi rî
Jiyan bi cûk şazde sal
Ez bibûm sermyanê mal
Şiyar di bûm zû ji xew
Ser dengê şalûr û kew
Taştê qeymax û nîvişk
Ne lorik û ne wek kışk
Nanê sêlê b' hilatî
Tevda dixwar b' civatî
Çêkirina wî zadî
Dezgê Emşa hinadî
Nîvro diçû bêriyê
Nava dara ser çiyê

Gava ca min pez di dot
Her carê ji mir di got

Ji mir bêne berindîr
Herdû bizin û tiştîr
Keça çeleng serbêrî
Di bin cavar di nêrî
Şohî, gulik hevirmêş
J'sê renga hevo û bêş
Gerden morîk û kespik
Bilind bûn cotê memik
Gelek pelikên ji zêr
Li ser sîngê bibûn gêr
Bisk li gulya geryaye
Xîlxal zîvê kil daye
Pêlav ji çerm bi kabik
Li ser hebû du bizmik
Xuşîn di ketî xîlxal
Bi hibrî û bê pêşmal
Teşî rist û ser bilind
Jina mala keça rind
Li vegera wê bêryê
Serdana li ser çiyê

Çakê me Ebdul ezîz
Bayê gelî fîze fîz
Bêtir xwes bû ew buhar
Çîçek û kulîlk û dar
Kanya avê li herik
Ser tije xort û keçik
Pir zelal bû çira şîr
Derdiketî ji sê bîr
Ne cê kunda û konan
Wargê mîrxasê sînkan
Paşê me berx dan di kir
Dora me komê kevir
Konê reş weke ziya
Em tev koçerê miya
Êlek mezin wilo firk
Tev Ereb bûn ne wek tirk
Bi çifte û bi dermanc
Em tenê'l wê de Kurmanc
Danî bûn ber newalê
Ber pala wê pesalê

Carna di çûn nêçîrê
Li ser çiyê dor bîrê
Nêçîra kewê gozel
Bûye j' kevnetorê gel
Nikil sor û pir xweşik
Ser piştê tevde pitik
Gelkî jîre ew bi xwe
Lê dijminê serê xwe.

Şam – Zindana E dra
10-1-1993

GUNDÊ ME

Dora gundê me xweşe
Lê bextê me çi reşe
Bi av û cot û cobar
Ber newalê ketî xwar
Bê mîweye mixabin
Tev li karin mîr û jin

Tije berx û mî û kar
 Bê halet û bê dewar
 Karê me b' lez û bezê
 Tevde bîrên tirwazê
 Coka mezin pişt mala
 Lê mixabin tim vala
 Çi civatek wilo sar
 Li vî gundî bê yextyar
 Min çandibû dar û rez
 Li wir tenê ez bê pez
 Tiryê şêrîn bi demûş
 Ne tirşoke wek kerkûş
 Dar û mêwe pir celeb
 Hin mi anîn ji heleb

Xwedê çi b' serêm anî
 Sêsid dar jê hilwanî
 Sêv û hirmî û biyok
 Tev hişk bûne ser û kok
 Hinar û gwîz û hejîr
 Ji derdê wan bûme pîr
 Zeytûn, bi'îv û hincas
 Van petêxê enenas
 Miradêm pê ne şâ bû
 Bîra min tev xera bû

Bibûm wek har û dîna
 Dar tev mirin ji tîna
 Paşê ez hatim bajar
 Bikim abûrî û kar
 Nû derketî ji hepsê
 Biner bê şens çawa tê
 Li min pir bûne dijmin
 Lê ez çibkim mexabin
 Çîrok gelkî dirêje
 Nikarim gişî bêje

Van kurmancê bê nifûs
 Ji bo wan bûme mehbûs
 Du sala man li zindan
 Me dî êşkenc û lêdan
 Tev ji jiyan bû winda
 Nema vegeryam gunda
 Wilo feqîr dilo dîn
 Bûm şifêrê Izedîn
 Li ser enga hire hop
 Ne firêm û ne sitop
 Çav şikestî wek hewdik
 Tiştê xweşik lê hindik
 Vîdyo tilfaz xerabe
 Dengê radio pir qube

Bi ser mide pite pit
 Bi gazin û bi minnet
 Çûn û hatin li heleb
 Bi mer têne her celeb
 Hin serxwebş û hin zaran
 Ev karaya pir giran

Bi vî hawî'z ne mirtah
 Cîgirê m' Ebû Zingah
 Lê westegeha me xweş
 Tev kulîlk û riwêñ geş
 Hin kêtik û şêxanîn
 Tevde gênc û ciwanîn
 Dorê bi darê zeytûn
 Li ber çayê serxwebûn
 Mamostakî pir hêja
 Her gav wilo dibêja :
 Çima tim fen li me tê
 Guh bidin vê şîretê
 Dewlemendê mal genî
 Li min negir ezbenî
 Bi mer nakin xebatê
 Navêñ riya felatê
 Ne himberin mixabin
 Carma rîncberê dijmin

Bi bin yek gelên bindest
Her bijî bavê Serbest

Dinyake pîs bû ellê
Dora çûbûme Diclê
Pir bi tab û kesafet
Lê bi rastî bê minnet
Rêke dûr bû bê tevdîr
Reşad ken'an bû midîr
Bi qapane li ser wan
Cî girê wî bavê Cwan
Orta Tedmur Dêr elzor
Her berê min li ber jor
Rêke fere û pir xweş
Li wir hebû konêñ reş
Ne wek Ereb û Urban
Tev mikûsê Qereçyan
Qeder ji wêde tê bû
Se'et yazdê şevê bû
Bayê reş kir fîze fîz
Mij û dûman wer dilîz
Pêre piçkê baranê
Pêşya meha nîsanê

Kemyoneke pir mezin
Şewq bilind dihate min
Niza sikran razayî
Li wê şevê wî bayî
Kir gurmîn û li min xist
Camên basê hin şikest
Bi ser mide hilweşand
Çermê serê mi çirand
Ketim li wir birîn dar
Bê hêvî wilo neçar
Hinek rîwî xwedî xêr
Bi şîmet û pir cwamêr
Rahiştin min ez dibir
Anîm misteşfa tedmur
Çend roj li wir dibûran
Hin li hepsê hin derman
Paşê ez hatibûm mal
Da bibînim bê çi hal
Ji wir çûme şirketê
Binerin vê hikmetê

Hêvî reş bû mixabin
Dûra ji wir berdan min
Dîsa li vir mam bê kar
Bê hêvî wilo ne çar
Seyda berê wer gotî
Dil û ceger pir sotî :
" çi te xwar û çi wî xwar
hûn herdû tev ji yek dar"

Hesekê
25-5-2003

**JI BO
BIÇÜKA**

72 Nêrgiz (1)

JI BO BIÇÛKA

ROVÎ Û TIRÎ

Hey rovî rovî rindik
Herdû guhê wî miççik

Li piş reza zîvirî
Çav ma li dara tirî

Xwe'd ser bendêre qevast
Dora devê xwe alast

Li bin darê sekinî
Ev goşî baş ev genî

Herdû nig wî kirin cot
Diran bi hevdû dikot

Çiqasî xwe vezeland
Goşîj darê ne qetand

Devê wî negha tirî
Çav li serî zîwirî

Go mîrato hermûşe
Bi gemar û demûşe

Çi dara pûç û pişe
Tiryê wê gelkî tirše.

KER Ü ZAROK

Kero kero bê hefsar
Dirreviya ji ber bar

Li bazdanê da tîska
Kir girî îske îska

Zaroka l' pê baz dida
Sond xwarine bi Xweda

Wê wî bigrin bibin aş
Ser piştê kin cotek xaş

Kirye qîrîn dizirya
Ketî nav dar û devya

Mij û dûman û ba bû

Li wan dera winda bû

Zû bigerin b' tevayî
Li vê çolê vî bayî

Berî lê bibe şev reş
Em bibînin kerê beş

Wî girêdin li axwur
Pir hene keftar û gur

Wê wî buxun li qadê
Bê ker bimînin yadê.

MIŞKO

Mışko müşko müşkavir

Te revandî nanê pir
Kete qulê bir û bir
Li wir xwarî kire kir

* * *

Xefkek bicûk me anî
Hinek nan pêr hilanî
Li ber qula mişk danî
Wî bigirin bi zanî

* * *

Mişko terî kirye rep
Xwe avêtî rast û çep
Gava dîtî nan û gep
Hate li ser gote ep

* * *

Xefka baş û têz kirî
Diran tûj û vekirî
Mışko girt sist bû terî
Bû çîz çîz kirye girî.

MAR Û ROVÎ

Mar û rovî bûn birak
Dest dan hev bi dilê pak

Herdû birêde di çûn
Rastî avek mezin bûn

Bi gotin û ştexalî
Çilo herin wî alî

Marê zik reş û belek
Li bîrê fenin gelek

Lo birako ey canim
Ez bi avê nezanim

Rovî rahiştibû mar
Kete nav ava dijwar

Gelkî kûre şîpe av
Dûr ketibûn ji delav

Mar xwe li rovî gerand
Serê zelût lê hejand

Li ber hust û qirikê
Pê vedim li vêdekê

Rovyê fenek xapînok
Jêre gotî ev hevok :

"Dilê min wê bibe ges
ez maçîkim çavê reş "

Gava xwe berde anî

Rovî gezek lê danî

Qîlê mezin têde bir
Ah wilo bimir li vir

Serê mar tev perçiqî
Jarek pir jê pijiqî

L'devê rovî bela bû
Dilê wî vexumya bû

Hin bi xap û hin pîsî
Ew jî li wir fetisî
DARÊ

Wey darê darê darê
Sor bû gula hinarê

Dara me pir xweşike
Pel û ser şax şînike

Binê wê qehwe rengî
Gelek bi nav û dengî

Hero avê jêr tînm
Pelê wê na qetînim

Dara me gelek başe
Mêwe ji mer belaşê

Bi sîk û ser tije çûk
Li hewşê tim weke bûk

Ez di bêjim we hemya
Her bijî dar û çiya.

ÇÜK Ü XEFK

Çûkê serî bi kumik
Danî bû li ser tilmik

Dinya sar û serma bû
Ew ji nêza qumya bû

Revyaye ji ber bazî
Bi qêrîn û bi gazî

Li dora xwe zîvirî
Li wir bû tûmek dirî

Hin bi hin ber pêde çû
Nava mijê tevde dû

Ew axaya pir vedâ
Hêvî û omîd xweda

Peya mîre ne xanim
Li wir dî libek genim

Gencê serî li ba kir
Darê xefkê xuya kir

Paşoşûn vedigerya
Hiş û ceger di hejya

Ev xap û fêzê dijmin
Ka şîreta dêka min

"Eger libik ne fene
ev çi darik û bene".

PİRÊ Û DÎK

Pîra mezin ser bi şar
Berî lê bibe êvar

Kar û barê xwe di kir

Genmê xwe hin vala kir

Ji tûra û ji ferdan
Wê bikute hinek dan

Genmê paqij weke zêr
Raxistî dora destêr

Kulm bi kulm vala di kir
Mal şêrîne wek şekir

Higî bi lez ew bezî
Çend lib ji nav pengizî

Dîkê birdik weke pet
Çavê wî l' genim di ket

Ew dîkê jîr û rêzan
Li pêş pîra du diran

Çend lib ji genim dixwar
Guh neda şûnik û dar

Ji bê hişî û kêm mixî
Ewê pîra pirnixî

Rahişt şûnik dihejand
Çavekî dîk pê rijand

Heqî xuya û belî
Dîk li pîrê çû gilî

Gerya bû li şaristan
Anî leşkerkî giran

Gundor û tûpişk û mar
Bi hevbendî dost û yar

Gelek pîlan wan danî
Gundor hildan ser xanî

Mar xwe gerand nav holê
Tûpişk ketibû solê

Hin ji derve hin ji bin
Pîrê li wir hat kuştin.

PAYÎZ

Payîzê hey payîzê
Çû dema ger û lîzê

Vaye vebûn dibistan
Dû çê dibe li ezman

Bikirin pêlav û çek
Xame, defter û birek

Dema çot bû dema kar
Zevyê rakin bû bizar

Bi çînin genim û ceh
Çê dibe va hersê meh

Tevde razên li hundur
Bû vîzîna bayê kur

Pelê dara tev zer bûn
Kulmozê çola der bûn

Şalûr û çik çûn qula
Xwekitî ket ser mila

Deynin tiştê zivistan
Savar û bastêq û dan

Nîşana zer bû payîz
Gelek xweşe rûnê hîz.

ZIVISTAN

Lewendo rabe ji xew
Xewnê şeva hin derew

Bibar bibar baranê
Ronak ketî hêlanê

Zivistane gelkî sar
Bi kuliya berf di bar

Dinya şilî şepelî
Xuşîn ket dar û gelî

Rûdinêñ dora agir
Dengê tava tê hundir

Van şevê reş û dirêj
Pîrê çîroka d' bêj

Bixun hejîr û mewîj
Qizwan, pastêq û guhîj

Gelek şeva d' keve qîr
Ava gola wek kevir

Vaye hatî bayê reş
Zozê rabe zû bi meş

Da em herin dibistan
Pir baran tê ji ezman

Nû dibûrî mamosta
Çente, pirtûk li destâ

Bijî bijî dibistan

Xuya erdê zivistan.

BUHAR

Mizgîn li we hat buhar
Bişkivîn kulîlk û dar

Av ketî gol û çema
Bahoz û serma nema

Vebûne cok û kanî
Bimre dîlî, xizanî

Rengîn bûn dar û devî
Av herikî j' ber kevî

Pilingê sermê diket
Pir hatin quling û bet

Şev û ro hat qirarê
Bîst û yekê Adarê

Çûçika hêlîn çê kir
Li ser şaxa, ber kevir

Şîn dibe çol û çiya
Bû zana bizn û miya

Hero dirin bêriyê
Li gunda û beriyê

Dema hêvî û mirada
ramûsim bav û dada

Bera here zivistan
Bi xweş biçin dibistan.

KURÊ JÎR

Hevalo kurekî jîr
Hêjaye bibe wezîr

Sibê zû radibî j' xew
Neyarê xap û derew

Berî taştiya siba
Maç dike dê û baba

Baş şûştibû rû û dev
Pirtûk danîne ser hev

Paqjin çek û pêlav
Xwe dişo b' sabûn û av

Çente bi dest hilanî
Tişte kêm li mal danî

Berê xwe da dibistan
Nava sermê zivistan

Mamosta jê hez dikir
Xelata baş pê vekir

Bijî lawê baş û rind
Dê û bav jê ser bilind.

NAVEROK

Diyarî	3
Kurtejiyana min	5
Pêşgotin	7
Qawîşa şesa	9
<u>Birê evînî</u>	
Nêrgizê	11
Meşe govendê	14
Yarê	20
Şoxê	26
<u>Birê civakî</u>	
Dermanê guriya	29
Pisikê sor	34
Bang	37
Hevpariya teba	39
Adar	43
Çeko û Sêvê	46
Lokê sor	51
Pakrawan	53
Kalo	55
Begmez	59
Rovyê bejê û ê çiyê	62

NAVEROK

Serdana mezel	67
Li zindanê	69
Gundê me	75
<u>Ji bo biçûkan</u>	
Rovî û tirî	85
Ker û zarok	86
Mışko	88
Mar û rovî	89
Darê	91
Çûk û xefk	92
Pîrê û dîk	95
Payîz	97
Zivistan	99
Buhar	101
Kurê jîr	103